HALKLARIN DEMOKRATİK PARTİSİ

# BULTENA ÇANDINIYÊ YA HDP'Ê

TIRMEH-TEBAX
2020 / SAYI: 06-07

# BULTENA MEHÊN TÎRMEH Û TEBAXÊ

*Tirkiye di sektora çandiyê de ku her tim hinardeyî welatên din dikir lê belê bi hatina desthilatiya AKP'ê ya ji sala 2002'yan ve, ev rewş veguherî ku bû welatekî her bi hawirdeyê ve girêdayî. Tirkiye, hilberînên wekî; nok, garis, genim, nîsk, birinc û titûnê hawirde dike. Ligel sepana van polîtîkayên hawirdeyê pirsgirêka ku herî zêde cotkar pê re rûbirû dimînin jî dahata zêde ye. Tirkiye di warê hilberîna çandiniyê de herî zêde bi tov, gubre, dermanê çandiniyê û mazotê ve girêdayî derve ye. Di heman demê de zêdebûna dowîz jî maliyeta hilberînê zêde dike û dibe sedem ku êdî cotkar nikaribin hilberînê bike.*

*Tirkiye, di mijara çandiniyê de, ji ber xwedî şert û merên erdnîgarî û avhewayeke baş e bi salan di cîhanê de 7'emîn welat bû ku têra xwe dikir lê belê bi hatina desthilatiya AKP'ê re di nav salan de hawirde zêde bûye û ji be sedemên zêdebûna maliyeta amûrên ku ji der ve tên hilberîna çandiniyê, qadên çandiniyê, cotkar û kesên ku vî karî dikin gelekî kêm bûye.*

*Di sala 2002'yan de zeviyên ku dihat çandin 26 milyon û 579 hezar hektar bû lê di sala 2019'an de ev daket 23 milyon û 94 hezar hektarî. Li gorî vê rewşê qedên çandiniyê di nav 18 salan de bi qasî ji sedî 12,3 kêm bûye. Di sala 2008'an de hejmara cotkaran milyonek û 127 hezar bû di sala 2019'an de daket heta 600 hezarî. Ev dane tê wateya ku ji sala 2008'an û vir ve 541 hezar û 600 cotkar kêm bûne.*

*Di heman demê de li gorî daneyên TUÎK'ê di sala 2002'yan de 7 milyon û 458 kes di sektora çandiniyê de dixebitîn, piştî meha sibatê ya 2020'an ev rêje daketiye 4 milyon û 157 kesan. Ev jî tê wateya di navbera 18 salan de 3 milyon û 301 hezar kesên ku karê çandiniyê dikirin kêm bûne. Bi vê yekê re jî derdikeve holê ku kesên di sektora çandiniyê de dixebitin hejmara wan ji sedî 44 kêm bûye.*

*Hemû van daneyan didin xuyakirin ku ev yek encama sepandina polîtîkaya neolîberal a li ser çandiniyê ye. Ev tabloya heyî bi xwe re polîtîkayên hawirdeyê jî tîne rojevê. Hawirdeya Tirkiyeyê ya di sala 2002'yan de 3.7 milyar dolar bû, ev yek di sala 2013'yan gihaşt 16.8 milyar dolarî. Di sala 2019'an de jî ev yek gihaşt 11,51 milyar dolarî.*

➲ ***Tarım Arazisi / Hektar***

***2002'de 26 milyon 579 bin hektar***

***2019'de 23 milyon 94 bin hektar***

➲ ***Çiftçi Sayısı***

***2008'de 1 milyon 127 bin olan çiftçi sayısı***

***2019'de 600 bine kadar düşmüştür.***

➲ ***Tarım sektöründe istihdam edilen kişi sayısı***

***2002'de 7 milyon 458 bin kişi***

***2020 Şubat ayı itibariyle 4 milyon 157 bin kişiye gerilemiştir.***

➲ ***Türkiye'nin tarım ithalatı***

***2002'de 3.7 milyar dolar olan Türkiye'nin tarım ithalatı,***

***2013 yılına gelindiğinde 16.8 milyar dolara çıkmıştır. 2019 yılına gelindiğinde ise ithalat 11,51 milyar dolar***



## Hilberîna di destên cotkaran de disekine, AKP bi 81 Milyar Dolarî Hawirdeyê dike!



*Cotkar hewl didin hilberînên di destên xwe de yên mîna pîvazan bifiroşin şaredariyan.*

Di hevdîtinên Wezaret Daristan û Çandiniyê ya butçeya 2020'an de jî derketibû holê ku Tirkiye di çandiniyê de ketiye rewşa hawirdekirinê. Li gorî vê yekê:

- ✱ Li beramberî kîloyek hinardekirinê me 6 kîlo berhemên çandiniyê hawirde kir.
- ✱ Di navbera salên 2002-2019 de 19 milyon û 545 herzar ton garis hatiye hawirdekirin û 4,2 milyar dolar dowîz hatiye dayîn.



**JÎ BO 2 MÎLYON Û 573 HEZAR TON**

***birincê hawirdekirî milyar û 420 milyon dolar***



**JÎ BO 9 MÎLYON Û 873 HEZAR**

***hawirdeya tovên gulberoj 5 milyar û 68 milyon dolar***





**JÎ BO 17 MÎLYON TON**

***türevleri, ham yağ, rafine yağ, hawirdeya rûnê xwerû, rûnê rafînekirî, ji bo kusp 11 milyar û 750 milyon dolar***

***hatiye dayîn.***

Di serdema desthilatiya AKP'ê de ji hawirdekirina kayê bigire heta hawirdekirina sewalan hema bêje di her qadê de hawirdekirin derket radeya herî jor. 8 milyon serî sewal, 300 hezar ton jî goştê sor hat hawirdekirin. Giştî me bi 81 milyar dolarî hilberîna çandiniyê hawirde kiriye, li beramberî vê hawirdekirinê jî bi 13 milyar dolarî hinardekirina me heye. Li aliyê din deynê çandiniyê yê di sala 2018'an de jî derketiye 103 milyar û 133 milyon û 541 hezar bin TL'yî.

***https://www.sozcu.com.tr/2019/ekonomi/tarimda-net-ithalatci-olduk-5452112/***

Di rastiyê de hawirdeya berhemên çandiniyê ya AKP'ê di esasê xwe de li ser pêdiviyê nîn e, hat famkirin ku li hemberî cotkaran wek darê zorê bi kar tîne. Çimkî cotkarên ku li ser lêçûna buhayên berheman diyar dikin û ji aliyê dewlet û sektora taybet ve nayê qebûlkirin, ketina dewrê ya darê zorê yê AKP'ê nêzîkatiya çandinî û cotkaran nîşan dide.

Polîtîkayên hawirdekirina berhemên çandinî û sewalan a AKP'ê ji pêdiviyan naqewime. Polîtîkayên bi vî rengî yên desthilat pêk tîne, di esasê xwe de gelek peymanên navneteweyî ku berê Tirkiyeyê ji bo berjewendiyên cotkaran kiribû, cih digire.

Mînak, peymanên wekî Peymana Çandiniyê ya Rexistina Bazirganiyê ya Cîhanê (DTO) ya 1994'an û stard-bey a IMF'ê ya 1999'an. Tirkiye bi van peymanan re soza dê hewl bide serarastkirinên baş bike da. Di nav van de rakirina subvansiyonên wekî tengkirina kirînên pişgiriyê, mazot, gubre, derman û hwd. cih digirtin. Ji ber vê yekê ev peyman pêşiya taybetkirinê jî vekir. Gelek saziyên der barê berhemên çandiniyê de fonksiyona xwe winda kir û nava van saziyan hat valakirin. Serbestiya fînansa çandiniyê ya DTO'yê, nêzîkatiyên astengkirina polîtîkayên parastinê ya dewletê, genim di serî de stokkirina gelek berheman ji aliyê Ofîsa Berhemê Zeviyê (TMO) ve asteng kir. Stokkirin li ber bazirganiya kurewî asteng e. Divê pêdivî bi hawirdeyê ve pêk were. Ji ber vê yekê gav bi gav vekişandina dewletê ya ji qada çandiniyê bû sedema çandiniya welat bikeve bin serweriya sermayadarên taybet û cotkar bi tena serê xwe bimînin. Mînak, mişmiş, findiq û lîmon tevî ku ji aliyê reqemî ve pêdivî bi hawirdeyê tune be û tenê wekî hincet nîşandayîna peymanên navneteweyî jî di esasê xwe hewceyî ravekirinê ye.

| 2015/2016 | Üretim Miktarı TON | İthalat Miktarı TON | Ülkeler | Yeterlilik Derecesi |
|---|---|---|---|---|
| Ayçiçeği | 1.637.900 | 2.798.851 | Moldova %55<br>Bulgaristan %32 | %73,40 |
| Arpa | 8.000.000 | 107.351 | Fransa %57,33<br>Danimarka %42,5 | %106,50 |
| Buğday | 22.600.000 | 4.109.527 | Rusya %59,9 | %113,60 |
| Mısır | 6.400.000 | 603.739 | Rusya %72,6 | %105 |
| Çeltik (Pirinç) | 552.000 | 198.876 | Rusya %42<br>ABD %33 | %69,90 |
| Çay | 1.327.934 | 28.000 | Sri Lanka %75 | %99,20 |
| Kuru fasulye | 235.000 | 53.000 | Meksika %24,7<br>Hindistan %23,3<br>Kanada %18,2<br>Arjantin %17,5) | %82,60 |
| Nohut | 460 000 | 37 631 | Meksika %36,9<br>Hindistan %25,1 | %98,10 |
| İncir | 300 600 | 2 405 | Almanya %39<br>Fransa %18 | %603,90 |
| Üzüm | 3 650 000 | 14 303 | İran %34<br>Şili %26<br>Güney Afrika %20 | %141 |
| Domates | 12 615 000 | 11 000 | Rusya %65 | %110,80 |

*dogrulukpayi.com Pîleya Besbûnê û mîqtara hawirdeyê ya berhema çandiyê ya Tirkiyeyê ya di navbera 2015-2016'an*

## TARIM ÜRÜNLERİ DIŞ TİCARETİ (STIC) (Milyon $)

| Yıllar | İhracat | İthalat | Denge | İhracat Değişim % | İthalat Değişim % | İthalatın İhracatı Karşılaştırma Oranı % |
|---|---|---|---|---|---|---|
| 1996 | 4.949 | 4.866 | 83 | | | 101,7 |
| 1997 | 5.470 | 4.926 | 544 | 10,5 | 1,2 | 111,0 |
| 1998 | 5.053 | 4.322 | 731 | -7,6 | -12,3 | 116,9 |
| 1999 | 4.442 | 3.398 | 1.044 | -12,1 | -21,4 | 130,7 |
| 2000 | 3.856 | 4.156 | -300 | -13,2 | 22,3 | 92,8 |
| 2001 | 4.349 | 3.080 | 1.269 | 12,8 | -25,9 | 141,2 |
| 2002 | 4.052 | 3.955 | 97 | -6,8 | 28,4 | 102,5 |
| 2003 | 5.257 | 5.265 | -8 | 29,7 | 33,1 | 99,8 |
| 2004 | 6.501 | 6.059 | 442 | 23,7 | 15,1 | 107,3 |
| 2005 | 8.309 | 6.480 | 1.829 | 27,8 | 6,9 | 128,2 |
| 2006 | 8.634 | 7.286 | 1.348 | 3,9 | 12,4 | 118,5 |
| 2007 | 9.769 | 9.812 | -43 | 13,1 | 34,7 | 99,6 |
| 2008 | 11.474 | 13.038 | -1.564 | 17,5 | 32,9 | 88,0 |
| 2009 | 11190 | 9.631 | 1.559 | -2,5 | -26,1 | 116,2 |
| 2010 | 12.664 | 12.880 | -216 | 13,2 | 33,7 | 98,3 |
| 2011 | 15.279 | 17.574 | -2.295 | 20,6 | 36,4 | 86,9 |
| 2012 | 17.994 | 16.370 | -376 | 4,7 | -6,9 | 97,7 |
| 2013 | 17.739 | 16.916 | 823 | 10,9 | 3,3 | 104,9 |
| 2014 | 18.753 | 18.060 | 693 | 5,7 | 6,8 | 103,8 |
| 2015 | 17.444 | 16.059 | 1.385 | -7,0 | -11,1 | 108,6 |
| 2016 | 16.857 | 15.638 | 1.219 | -3,4 | -2,6 | 107,8 |
| 2017 | 15.818 | 16.514 | -696 | -6,2 | 5,6 | 95,8 |

NOT: STIC 0,1,22,23,24,25,26,29,4 kalemleri

***dogrulukpayi.com Pîleya hinerdeya û hawirdeya çandiniyê ya Tirkiyeyê ya di navbera 1996-2017'an de bi Kovid-19'ê re fatoreya hinerdaya çandiniyê ji sedî 58 zêde bû.***


## COVID-19 İLE TARIM İTHALATI FATURASI %58 ARTTI

Yek ji sektora sereke ku ji Kovid-19'ê bandor bû, sektora çandiniyê bû. Daxuyaniya Rêxistina Xurekan a Cîhanê (FAO) di destpêka vîrusa koronayê de, diyar kir ku divê hikûmetan bandora kêmkirina vîrusê ya li ser bazirganiya xurekan a kurewî û ewlehiya xureken bi awayekî baldar tev bigerin.

Vîrusa ku mirovan hepsî malan kir bû sedema biryarên girîng ên têkildarî bazirganiya çandinî ya derve. Girtina sînoran, qedexekirina balafiran, nezelalbûn, girîngiya peydakirina xurekan a nav welatan zêde kir.

Ji ber sedema virûsa koronayê nehilberînê û sedema stokkirina berhemên çandiniyê, di encama bilindbûna buhayan de 2 mehên destpêka salê 9 berhemên me yên ku herî zêde tên xwarin buhayê wan ji sedî 58, miqtara wan sedî 72 zêde bû.

Zêdetir li ser sedema vîrusê li Tirkiyeyê, ji ber sedemên polîtîkayên hawirdeyê nirxên axa Anatoliya û Mezopotamyayê ku navenda genim in, ketiye û berhemên çandiniyê tên hawirdekirin. Di 2 mehên salê de hawirdeya genim li gorî sala borî ji sedî 36 zêde bû û di 2 mehan de ji bo hawirdeya milyon û 562 ton genim, 390 milyon dolar hat dayîn.



# 2 ayda sadece 9 ürüne 900 milyon dolar ödedik

| Ürünler | 2019 (Ocak-Şubat) Miktar (ton) | 2019 (Ocak-Şubat) Değer (milyon$) | 2020 (Ocak-Şubat) Miktar (ton) | 2020 (Ocak-Şubat) Değer (milyon$) |
|---|---|---|---|---|
| Buğday | 1.147.839 | 292 | 1.562.202 | 390 |
| Arpa | 98.293 | 26.4 | 368.732 | 74.4 |
| Mısır | 202.530 | 49.5 | 695.971 | 140.6 |
| Çeltik | 27.619 | 9.9 | 21.235 | 7.2 |
| Pirinç | 14.487 | 8.8 | 14.203 | 5.2 |
| Fasulye | 1.878 | 2.2 | 2.707 | 2.8 |
| Nohut | 702 | 788.9 | 3.541 | 3.3 |
| Mercimek | 44.050 | 18.7 | 94.893 | 38.5 |
| Ayçiçeği (yağlık) | 100.710 | 38.6 | 251.8 | 103.2 |
| Ayçiçeği (çerezlik) | 16.616 | 18.3 | 22.353 | 24.4 |
| Soya | 272.623 | 103.3 | 280.994 | 108.4 |
| Genel toplam | 1.927.351 | 568.7 | 3.318.698 | 898.9 |

***sozcu.com.tr salên 2019-2020, di hin berhemên çandiniyê de tabloya beramberanîna nirxên hawirdeyê.***

## LI RÛXMÊ VÎRUSA KORONAYÊ HAWIRDE ZÊDE BÛ

Di pêvajoya vîrusa koronayê de di serî de Rûsya, Ûkrayna, Qazakistan hin welatên hilberîner hinardeya dexl û dan kêm kiribûn lê di vê pêvajoyê de hawirdeya Tirkiyeyê zêde bû.

Di vê pêvajoyê de, di pênc mehên destpêkê yên sala 2020'an de li gor pênc mehên sala borî hawirde di rêjeyeke girîng de zêde bû. Li gor daneyên Saziya Îstatîkê ya Tirkiyeyê (TÎK) di pênc mehên ewil ên îsal de li gor heman heyamê ya sala borî di hawirdekirina genim, ceh, riwekek û birinc de zêdebûneke girîng çêbûye.

> ***"Di meha gulanê de hewirde ji hinardeyê zêdetir e"***

Di meha gulanê de li Tirkiyeyê hinardeya çandinî 1 milyar 224 milyon dolar, hawirde derket 1 milyar 256 milyon dolarî. Piştî gelek salan cara ewil di gulana 2020'an de hawirdeya berhemên çandiniyê li gor mehê li hinardeyê zêdetir bû. Di dema vîrusê de cotkar bi gelek zor û zehmetiyan re mijûl bûn, bi qeyrana aboriyê re rû bi rû man.

### *Hububat ürünleri ithalatı (Ocak-Mayıs)*

| ÜRÜN | MİKTAR (BİN TON) | | DEĞER (MİLYON $) | |
|---|---|---|---|---|
| | 2019 | 2020 | 2019 | 2020 |
| Ekmeklik Buğday | 2.900 | 3.400 | 726 | 799 |
| Makarnalık Buğday | 428 | 828 | 119 | 250 |
| Soya | 1.200 | 1.300 | 449 | 475 |
| Arpa | 129 | 507 | 34 | 100 |
| Mısır | 1.800 | 1.500 | 372 | 301 |

***2019-2020 Yılları İlk Beş Ay Hububat İthalatı***

## JÎ BAKURÊ SÛRÎYÊ YÊ ŞER LÊ DÎBOME DEXL Û DAN STANDİN

Ruxmê ku Tirkiye embara genim e jî ji rojava 20 hezar ton dexl û dan hewirde kirin. Tê îdiakirin ku di bin çavdêriya Gerînendeya Navendê ya Buroya Berhemên Çandiyê ya Rihayê (TMO) ji Sûriyeyê bi rêyên derhiqûqî dexl û danê tînin.



*Fotoğraf: artigercek.com*

***Di sala 2018'an de Efrîn ketibû destê TSK'ê û çeteyên herêmê. Îdaya ku zeytûnên li Efrînê tên hilberandin bi awayekî kaçax tînin Tirkiyeyê, di nav cemawerîyê de bibû sedama bertekên mezin.***

Desthilatdariya AKP'ê di demên berê de jî 60 hezar ton zeytûn ji bakurê Sûriyeyê desteser kiribû. Piştî anîna zeytûnên Efrînê hevsengiya piyaseyê xerab bûbû ji ber vê hilberînerên Tirkiyeyê yên zeytûnan zerar kiribûn.

## TEVÎ ÇÛKÛROVA Û HARRAN HENE PEMBÛ TÊ HAWIRDEKIRIN

Li gorî rapora sala 2009'an ya Gerînendeya Hilberîna Nebatî ya Wezareta Çandinî û Daristanê, tê gotin ku hilberîna pembû kêm bûye û hawirdeya wî zêde bûye.



***https://twitter.com/gamze_bozkaya Zeviyên Pembû yên Karataşa Adanayê***

Her çiqas pêdiviya hawirdekirina pembû bi zêdebûna hilberîna sektora tekstîlê ve bê girêdan jî li beramberî vê pêdiviyê, di serî de Riha divê sedemên li deştên hilberîna pembû tê kirin kêmkirina zeviyan bê vegotin.

## NÎRXANDÎNÊN RAYEDARAN ÊN DER BARÊ HAWÎRDEYÊ DE REWŞA TÎRSNAK ZELALTÎR DÎKE

Serokê Odeya Pîşesazî û Bazirganiyê ya Rihayê Îbrahîm Halîl Peltek û Serokê Konseya Pembû ya Neteweyî (UPK) Bertan Balçik diyar kirin ku li welêt pembû li ber qedandinê ye û gotin divê tedbîr bê girtin.



*Fotoğraf: egepostasi.com*

***Serokê UPK'ê Bertan Balçik got: "Wê derbeke cidî li hilberîna me ya pembû bikeve, em ê bi derve ve bên girêdan. Jixwe hawirdeya me hebû, ji vir şûn de em ê bêtir neçar bibin ji derve pembû hawirde bikin. Zirarên vê ji niha ve xuya dibin. Fatoreya em didin derve zêde dibe."***



***Serokê Odeya Pîşesazî û Bazirganiyê ya Rihayê Îbrahîm Halîl Peltek jî got: "Sektora pembû bi salan e li ser heman pirsgirêkan diaxive lê bi tu awayî jî nayên çareserkirin. Polîtîkayeke me ya bîstiqrar a pembû tune ye. Bi salan e em di nav heman pirsgirêkan de bêzar bûne."***

# HDP ÇI DIBÊJE?

❋ Di serî inşeati, divê zeviyên çandiniyê ji derveyî çandiniyê ji bo tiştên din neyên bikaranîn; ji ber sedemên erozyon an jî qirêjiyê rê li ber wendahiya zeviyan bê girtin; bi çi armancê be bila bibe, divê destwerdana sermayeya navneteweyî ya li zeviyan bê astengkirin û qanûna SÎT'a Çandiniyê (di serî de zeviyên çandiniyê û mêrg) bê derxistin.

❋ Li cihê ku zeviyên çandiniyê beyar bên hiştin, bi berhemên mîna nok û nîskan ên zeviyê dewlemend dikin rêbazên bi dorê bên teşwîkkirin. Bi vî awayî 40 milyon zeviyên beyar tên hiştin, wê bê ajotin.

❋ Ji nû ve çav li biryarên "ÇED baş e", "ÇED pêwîst e" bê xistin û bikaranîna zeviyên çandiniyê ji bo santralên enerjiya rojê, qadên madenê û depoyên avêtiyan bên astengkirin.

❋ Yek ji sedemên herî girîng ên jidestçûna zeviyan erozyon e. Divê xebatên têkoşîna li dijî vê bên çalakkirin.

❋ Hilberîna çandinî û gundewarî, divê ji piyaseya nayê pêşbînîkirin û diyarkeriya têkiliyên piyasayê re neyê hiştin û bi hedefên hişmendiyeke kamûyî û sûda civakî hemû pêvajo bên plankirin.

❋ Divê serweriya saziyên fînansê yên navneteweyî yên mîna IMF, DB, DTO'yê ya li zeviyên welêt bê bidawîkirin. Zeviyên hatine ber qedandinê divê ji nû ve bên bikaranîn.

❋ Li hemberî hemû polîtîkayên zeviyan dixin bin serweriya sermayaya navneteweyî, zeviyên hatine taybetkirin, di serî de KÎT'ên çandiniyê yên pênaseya wan a peywirê hatiye guhertin an jî hatine girtin, saziyên mîna Pîşesaziya Alif (YEMSAN)), Gerînendeya Giştî ya Şîrketên Çandiniyê (TÎGEM), Saziya Pîşesaziya Şîr a Tirkiyeyê (TSEK), Saziya Masî û Goşt (EBK), A.Ş'ya Berhemên Daristanê (ORUS), Saziya Çayê (ÇAYKUR), Şîrketa Anonîm ya Pîşesaziya Gubrê ya Tirkiyeyê (TŞFAŞ), Ofîsa Berhemên Zeviyê (TMO), Saziya Arastina Zîraî ya Tirkiyeyê (TZDK) yên destekên kredî, lêçûn û buhayan didin, ne ji bo karê lê bi hişmendiya sûda civakî bên malhemûkirin; girêdana bi derve ve ya gubre û tov ji holê bê rakirin.

❋ Hinarde û hawirdekirina berhemên çandiniyê ji bo sûda civakê bên kirin, destûr neyê dayîn ku polîtîkayên hinardekirinê yên xwegihandina gel a berhemên baş a ji ber sedemên kara pir an jî zexta berhema hawirde ya li ser hilberîna xwemalî pêk werin.

❋ Di serî de baqil û dexl û dan, ji bo rêlibergirtina rekolteya kêm, zeviyên çandinî li wan nayê kirin, ajotina wan zeviyan bê teşwîqkirin.

❋ Di sewalkariyên de polîtîkayên hawirdeyî, hilberînerên xwemalî dike zorê. Ji ber vê sedemê, di sewalkariyê de hilberîn bê esasgirtin, di serî de pez polîtîkaya sewalên hûr û gir bê şopandin û ev bikevin nav xebatên teşwîqkirinê.

❋ Ji bo maliyeta alif ê lêçûna sereke ya sewalvaniyê ye, bê daxistin hilberîna netabên alif bê zêdekirin. Polîtîkayên hawirdeyê yên alif di KÎT'ên nû bên avakirin de bên rakirin û polîkayeke têrî xwe dike bê sazkirin.

HDP Genel Merkez
Adres: Barbaros Mah. Büklüm Cad. No: 117 06680
Çankaya/Ankara

@HDPgenelmerkezi
www.hdp.org.tr

HALKLARIN DEMOKRATİK PARTİSİ